Hûn bi xêr werin pirtukxaneyê!

“Mirov bi gotinan dikare fahm bike.
Mirov bi gotinan dikare şerh bike.
Û, gotin dibin alîkarê me da ku em bikaribin
bi hev re bijîn”.

BENKT-ERIK HEDIN

Zarokek ku di demek zû ya jîyana xwe de çîrok û meselokan bibihîse, dibe xwediyê zimaneke dewlemend. Ji zarokên xwe re bi dengeke bilind xwendina pirtûkan, ji bo pêşdebirina ziman û fantazîyên wan baş e.

Bi rêya guhdarîkirin û axaftina bi zarokên xwe re, tu dikarî ji bo xwedîbûyîna zimaneke dewlemend, alîkarê zarokên xwe bibî. Her tiştên ku hûn bihevûdu re dikin, dibin alîkar da ku zarokên te bibin xwediyê zimaneke baş. Bixwîne, stranan bibêje, behs bike, şerh bike û bi zarokan re bileyîze! Vê yekê zûtirîn gav, hema ji destpêkê de bikin, ji bona ku bingeha zimaneke baş di dema destpêka jîyanê de tê avêtin.

Bi zarokên xwe re bi zimanê xwe bipeyîve. Eger zarok bibe zimaneke yekem a dewlemend, dê ew bikaribe zimanên din jî hîn rehettir fêr bibe.

Di pirtûkxaneyê de ji bo zarokên di hemû salan de pirtûk hene. Li pirtûkxaneyan pirtûkên nîşandayînê ji bo zarokên herî biçûk, pirtûkên biresim, pirtûkên mamikan, pirtûkên helbestan, pirtûkên meslekî (faktayî), pirtûkên çîrok û meselokan hene.

Di pirtûkxaneyê de ji bo kesên di hemû salan de û bi gelek zimanên cuda pirtûk hene.
Em bi kêfxweşî alîkarîya te dikin da ku tu tiştê ku lêdigerî bibînî û tu mesrefek ji bo deynkirina pirûkan tune ye!

Di pirtûkxaneyê de ji bo salmezinan pirtûkên li ser nexweşîyên zarokan, psîkolojîya zarokan, perwerdekirina zarokan û hwd. hene. Di pirtûkxaneyê de bi gelek zimanan, hem ji bo zarokan hem jî ji bo salmezinan pirtûk hene.

Bi xêr werin!

ILLUSTRATIONER: MARGARETA NORDQVIST

Länsbiblioteken i samarbete med Internationella biblioteket i Stockholm.

NordKurdiska/Kurmandji